pêkhatina wêna nehatîye bilikarxistin. Weha min di civîna yekemînî pêkhatinê de ji bona Hevalên xwe date bipêşkeşkirin, ku em bi navê Komelê Yasa Mafeyê Netewê Kurd bidin bilikarxistin û bidazanîn. Tevaya Hevalan pê hatin birûniştin. Weha di civîna pêkhatinê de ya tê dê emê, ger Xwedê xwest, ji bona pêkhatina Komelê, likarxistina wê û belavkirina yasa biserkevin. Ev yasa hanê dê xwedan nerxekî giringî wêjeyî, sincî û mêjûyî bête bidîtin, ku dê ew bikaribe bawerîya Netewê Kurd bi mafeyên wîyî bingehî ve bide bixurtkirin. Dibe, jî ku ew alîkarîya Desteyên Siyasîyî Kurd ji bona ronahîya rêya wan bide bikin. Dibe jî, ku ew rêzên wan bide biyekkirin û girêdanê li ser armancên bilind de bê pêç û pena jiber kêrên demjimarê bide bikin, heger ku wan ji xwe re date bixwestin.

Wehajî Yasa hîç tevaya giringbûna xwe nikare bide biwergirtin, hegerjî Miletê Kurd ji xwe re jî nikaribe tevgerike rizgarîkirîyî yek yanjî yekbûyî bide bipêydakirin, ku jêre Dam û Destgehekî Xebatîyî Siyasîyî yek yanjî yekbûyî tête bidîtin, ku ew bi bîr û bawerîyên bingehîyî hatîyî ve di Yasa de pê dide bibawerkirin û ew ji bona wan dide bixebatkirin, piştî ku ew wan di nava qalibekî siyasî de dide bivalakirin û armancên li ser wan de ji hev dide bicudakirin. Wehajî hegerjî me jî dîdarên mêjûyê û belgeyên mafeyî di ser guhê xwe re datin biavêtin, dê emê bi kêmanî ve danîna rewşa Netewê Kurd û mafeyên wîyî bingehî di deqên kêmanî de, nala yên ku ew tîn, bikaribin bidin danîn:

Miletê Kurd Neteweyekî, yê

ku ew bi xwe ve tête biderkevtin , bi xwedanîyên xweyîyên taybetîyên ji erd, ji ziman, ji mêjû, ji hêvî û berjewendîyên hevbeşî ve tevî perçekirina Welatê wî Kurdistan jî ji bal Kolonyalyê jî de dide bipêkanîn.

- Netwê Kurd niha ew di bin nîrê Kolonyaliyê de, Zordarîlêkirina Milî de, Vegirtina Sipahî de û Çewisandina Abûrî û Civakî de tête binexkirin. Ev jî li ser encamê siyaseta şovîniyî regezperestî de tête bikirin, ya ku hêjî ew Dewletên hanê li ser de têtin biçûyîn, yên ku wan Kurdistan di navbera xwe de ji piştî cenga cîhanîyî yekem de dane biparvekirin.

- Netewê Kurd mafeyê wî ji bona xebatê li pênavê tar û markirina zincîrên xwe û hilanîna bendên xwe de tête bidîtin, yên ku wî ji wergirtina mafeyên wî û azadîya Kesên wî didin bibêpişk û bibêparkirin. Herwehaji mafeyê wî tête bidîtin, ku ew bendên li pêşîya xwe de ji ber xwe bide bihilanîn, yên ku ew wî ji katbûna abûrî, pêşveketina zanyarî û pêşveçûna civakî didin bibêbehrkirin.

• Miletê kurd jî nala her Miletêkî din mafeyê wî di Çarenûsa xwe de bi xwe ve û bi tevaya azadiya xwe ve tete biderkevtin, ligel jî têjî de hilanîna sînorên çêkirî jî têtin bidîtin, yên ku ew per û baskên Welatê wî ji hev didin bidirandin. Herwehaji tede bi yekkirina Welatê wî ve di Dewleteke Kurdîyî Serbixwe de, di helbijartina rengê Serdarîkirinê de, yê ku ew ji xwe re dide bixwestin, di maldarîkirina dewlemendiyên erdê xwe û çewisandina wan de, di bikaranîna berkirina karê xwe de ji bona kara xwe, kara zarokên xwe û pêşvejistina abûriya xwe û geşbûna zanyariya xwe tete bidîtin.

• Netewê Kurd bi heremeke jîrdarî ve tete bimerovkirin, ya ku ew li rojhilata nêzîk û navîn de tete bidîtin. Herwehaji jêre jî pêwendiyên mêjûyî ligel Netewên dorhêlê de têtin bidîtin, ku Merov dikare wan jî, piştî ku Miletê Kurd bi mafeyê xwe ve bi carekê vê di Çarenûsa xwe de bi xwe ve bide bikaranîn, li ser bingehên nuh de bide binîşankirin û bihîmkirin, ku ew wekhevîya bi carekê vê, aşîtiya mayî û hevkarîya biratiyî pêwist di

navbera hemû van Netewan de û di navbera wan xwe bi xwe de didin bigirawkirin, li gora ku ew bi vîna xweyî hevbeşî û li pênavê berjewendîya wan tevan de, berjewendîya her yekî ji wan û ji bona pêşveketina jîrbûna heremê bi xwe ve didin bixwestin.

- Netewê Kurd bi demokrasîyê ve, bi avakirina aşîtîyê li ser bingehê dadwerîya civakî û bingehê dadwerîya siyasî û wekhevîyê de di nava Miletan û Netewan de, bi mafeyê hemû Mirovan û bi mafeyê hemû Miletan ve li cîhanê de di Çarenûsa wan de bi xwe ve li gora bîr û baweriyên Netewên yekgirtî de dide bibawerkirin.

**\* Danîna Dam û Destgehê Siyasî ji bona Rizgarîkirina Welatîyî Kurd:\***

Waha cudakirina pirsîyarîya danîna dam û destgehê siyasî ji pirsîyarîya mafeyên Netewê Kurdîyî bingehî, yên ku bi kurtî ve li jor de hatine bigotin, ne jî ji armancên xebata rizgarîkirinê û biryareyên xebatê, yên ku dê li ser wan de bi kurtî ve bête binavkirin, nikare bête bikirin. Ango dam û destgehê siyasî ew bi xwe ve ji bona bicihanîna rizgarîkirina welatîyî Kurdîyî giştî û hilgirtina

xebata wî Destikekî neçarî ye. Bi têgihîştineke din danîna dam û destgehê) bi navkirî ve ew bi xwe ve xistina armancên koçiyî perçekirî nala Xwedmoxtarîyê û guhertina wê bi armanceke bingehîyî bi tenha xwe ve dide biderxistin, ew jî bi rizgarîkirina Neteweyê Kurdîyî welatî ve tete biderkevtin. Evaya jî bi xwe jî ve çengbûnekê jî endazê tevgerên welatîyî Kurdîyî taybetîyî bi her perçeyekî ve -ew jî bi xwe jî ve pêrûniştin bi sînoren çêkirî bû, yên ku ew Impiryalîyê di nava Welatê me de dayite bipêkanîn- ji bona endazekî bilindtir dide biderxistin, yê ku ewaya ji bona tevaya Kurdistanê endazê welatîyî giştî û di tevgerê yekkirî de yanjî yekbûyî de dide biderxistin. Evaya jî bi kar ve û ne bi gotinê bi tenê ve, mîna ku em hin caran didin bidîtinn, divê bête bikirin.

Du rê ji bona danîna dam û destgehê siyasî têtin bidîtin û ya siyem niye:

Yekem: Ew bi xwe ve di rêya bi yekkirina Partî û Sazmendîyên Kurdî ve, yên ku ew têtin bidîtin, yanjî yên dê bêtin bidîtin, ku ew ji bona vê mebesta hanê di nêzîk de dê bêtin bipêkhatin, herwehaji ligel wan jî de Kesên Welatperwer, ji yên ku ew xwedan karin û dilxwaz di karkirinê de di xwe de dibînîn, di Sazmendîyeke Kurdîyî welatîyî giştî de ji bona tevan tete bidîtin, piştî ku ew ji bona pêrazîbûna peyrewê welatî û armanca rizgarîkirina Netewê Kurd û devjêberdana armancên din ji bil wêna sûnda pêwîst pê bête bixwarin.

Weha ji bona vî şeweyê hanê du sûd têtin bidîtin.

Yê yekem tete bidîtin; jiber ku ew li ber tevaya Partî û Sazmendîyên hene û ji bona Merevên welatperwer û demokrat rê pê dide bidan û ji wan tevan ketina nava dam û destgehê nuh û kelkwegirtin ji karnasîn û serpêhatîyên

wan têtê bixwestin. Weha bi vî rengî ve bi welatperwerîya tevan û bi xebata wanî çûyî ve pê têtê birûniştin.

Sûda Duwem ji lezbûna bikarina peydakirina dam û destgehê nuh de têtê biencamkirin. Na hêjbêtir sûdeke siyemî giring jî jêre têtê bidîtin, ku ew jî ji bona tevaya bawermendîyan û êdyolocîyan rê pê têtê bidan, ku ew di nava dam û destgehê nuh de bêtin bipeydakirin, bi mercekî ve, ku ew bawermendîyên hanê bi demokrasî bêtin biderkevtin û ew ne bi regezperestî ve bêtin biderkevtin.

Wehajî dibe, ku ji bona vî şeweyê hanê jî hin encamên neqenc bêtin bidîtin. Ew jî evin, ku hin ji Partî û Sazmendîyên niha ligel xwe de ji bona nava dam û destgehê nuh tiştêkî û mayînên ji pevçûnên xweyî berê bidin bianîn. Evaya divê neyête bikirin û divê zora wê bête bibirin. Herwehajî ligeljî de divê tevaya pevçûnên cihî, heremî, xweyî û mayînên êlîtî jî bêtin bihilanîn û divê li ser tevaya Partî û Sazmendîyên Endam peyrewa dam û destgehê nuh li ser peyrewên xweyî taybetî de bidin bidanîn; jiber ku ew dabeşka wênerîya berjewendîya bilindîyî Miletê Kurd dide biderxistin.

Weha ev şeweyê hanê bi xwe jî bû, yê ku ew ji bal Tevger û Sazmendîyên Felestînî ji bona bi yekkirina xwe ve di nava Sazmendîya Rizgarîkirina Felestînî de hatiye biwergirtin, bêyî ku ew xwe nala Sazmendîyan ji hev bidin bixistin. Lêbelê jî hemû pê hatin birazîkirin, ku ew berjewendîya Miletê xwe û peyrewa Sazmendîya Rizgarîkirina Felestînîyî hevbeşî li ser berejewendî û peyrewên xweyî taybetî de bidin bidanîn. Li vê derê de cudabûnek di vî babetê hanê de di navbera Sazmendîyên Felestînîyî Endam de di S. R. F. de û di navbera Partî û Sazmendîyên Kurdîyî hene de, yanjî di navebera hinekan



ji wan de tête bidîtin; jiber ku tevaya Sazmendîyên Felestînî ji bingeha pêşî de hemûyan ji bona Rizgarîkirina Felestînê didan biarmanckirin. Lêbelê giringtirîn Partîyên Kurdîyî heyî hêjî ew jî ji bona bicihanîna Xwedmoxtarîyê di nava sînorên Dewlîyî heyî de didin biarmanckirin. Pêwist pê niye, ku careke din li vir de bête bigotin, ku her Partîyeke Kurd ew nikare di dam û destgehê nuh de bi Endam bête bikirin, ger ku peyrewê wê di bingehîya xwe de ligel peyrewê dam û destgeh de di armanc û rizgarîkirina welatîyî Kurd de bi her têgihîştînekê ve bête bicudakirin. Wehajî dibe, ku dê dem bide bigirawkirin, ku dê Partîyên bi navkirî ve bername û armancên xwe bidin biguhertin. Evaya jî bi xwe jî ve pê tête bixwestin û biçavdêrîkirin. Weha bi lez ve dem tête bibezandin, ku pir dirêjkirina wê ne raste bête bikirin; jiber ku metirsîyan çavên xwe ji bona Miletê me dane beloqkirin. Lêbelê dam û destgehê nuh, di dema ku ew Sazmendîyan bi serhev ve dide bicivandin, yên ku ew li ser "Ewtonomiya" xweyî hundurû de di nav de didin biparastin, Merov dikare bi Berê Rizgarîkirina Kurdistanê ve û ne bi "Sazmendîyê", mîna ku Birayên Felestînî dane bikirin, bide binavkirin.

Rizgarîkirina welatîyî Kurd ew bi xwe jî ve di bingeha xwe jî de bi armanceke demokrasî ve tête biderkevtin û hîç demokrasî jî bê bicihanîna wê jî nayête bidîtin.

Wehajî tevlivêjî Merov dikare ji bona givaştîne bêtir li ser gotina demokrasîyê wê de di nava navê Berê de bide bixistin û Berê bi navê Berê Demokrasîyî Rizgarîkirina Kurdistan bide binavkirin.

Duwem: Ew bi xwe ve rêya ku Miletê Cezayirê ji bona peydakirina Berê Rizgarîkirina Welatîyî Cezayirî li ser de hatiye biçûyîn. Wehajî tevî ku gotina "Berê" jî di vî navê

mêjûyîyî qenc de hatîye biderkevtin, Berê Cezayirî bi xwe ve nemîna Berekî di nava jimarekê ji Sazmendî û Partîyan dihate bipêkhatin, lêbelê vanên dawî xwe bi xwe ve ji hev dane bixistin û tev de bi hev re bi carekê ve ligel Alî û Kesên welatperwerî din de di nava Berê Rizgarîkirina Welatî de hev dane bigirtin.

Xwezî jî Miletê Kurd jî bi ser vê rêya hanê ve bikarîba bida bigirtin; jiber ku ew bêtir bi kêrtir û serkevtî ve tete bidîtin û yekitîya xebatê di nava wê de bêtir tete bidîtin. Wehajî ew jî bi serûştîya xwe jî ve di pêşîya pêşî de hîç rê bianîna mayînên pevçûnên berê de û mêldarîyên heremî de yanî cihî de pê nade bidan, tevî ku ew jî di nava civakê jî de dihatin bipeydakirin. Weha civaka Cezayirî jî roja dazanîna şûreşa rizgarîkirina Cezayirî ew bi xwe jî ve nala her civakeke din jî bi dijbûnên xweyî taybetî û êdyolocîyên cuda ve, na hêjbêtir ew bi tovên cudabûnên ferhengî û zimanî ve di nava Xelkên wêyî Ereb û Xelkên wêyî Berber de dihate bidagirtin: Lêbelê jî tavaya van deste û berên hanê jî jiber xwe dijbûnên xwe dane bikerkin û dev ji wan dane biberdan û tevde ji dil û can ligel hevdû de di dam û destgehê rizgarîkirina nuh de hatin bihevgihaştin. Ji bona wan bes û bi tenha yek armanc dihate bidîtin, ew jî bes û bi tenha ve xebat bû, da ku Miletê Cezayir mafeyê xwe di Çarenûsa xwe de bi xwe ve bide bikaranîn. Wehajî Xebatvanên Cezayirî hîç rê bi xwe ve nedane bidan, ku ew careke din ji bona tiştêkî ji dijbûnên xweyî hundurû bêtin bivegerandin, bes û bi tenha ve piştî ku Miletê wan mafeyê xwe di Çarenûsê û helbijartina xwe de ji bona Serxwebûnê bikaribe bide bicîanîn û xurtkirina wê Serxwebûnê di nava Dewletan de

bide bixurtkirin<sup>32</sup>.

Wehajî gerjî çibe, şêweyî ku Miletê Kurd û desteyên wîyî welatî ji xwe re jî bidin biwergirtin, hîç gûman lê nayête bikin, ku dê ev Miletê hanê bi darê zorê ve li ser bête biçûyîn, da ku ew jî dam û destegehê xweyî siyasîyî niyazmendkirî ji bona rizgarîkirina xweyî welatî bide bidanîn.

**\* Armancên Bingehî ji bona Tevgera Rizgarîkirina Welatîyî Kurd\***

Ev armancên hanê ji mafeyên Netewê Kurd, ji zînetên hebûna wî û ji çarenûsa wî, ya ku ew bi xwe ve ji xwe re dide bixwestin, têtin bikanîkirin.

Weha Merov dikare wan, mîna ku ew têtin biderkevtin, bide bikurtkirin: -tevgera Miletê Kurd xebatê dide bikirine da ku Miletê Kurd bi mafeyê xwe ve di Çarenûsa xwe de xwe bi xwe ve û bi azadî ve bikaribe bide bikaranîn.

- Miletê Kurd nikare bi vî mafeyê hanê ve bi azadî ve pê bête rabûn, heger ku ew rizgarîkirina Welatê xwe, jê derkirina hêzên

---

<sup>32</sup>Piştfî helbijartina Serok Şazlî Îbin Cedîd nala Serokê Komara Cezayir wî bi Mîrîfî ve bi bîr û bawerî û bi canekî Demokrasî ve bi Pirsîyarîya Ferhengî ji bona Koma Xelkên Berber bi pêrûniştina wê ve date destpekirin û wî bi çarekirina wê jî ve date destpekirin. Ev pirsîyarîya hanê bi xwe jî ve ji pirsîyarîya rizgarîkirina welatîyî Netewê Kurd tête bicudakirin.

Vegirtinê û yên Kolonyalîkirinê, yên ku ew bi Borcuwazîya Serdarkirinê ve têtin bigirêdan, yên ku wan di nava xwe de niha Kurdistan dane bidabeşkirin, herwehajî jê derkirina Gemara Civaka Kurdîyî xinêz jî, ya ku ew ligel wan Hêzên Faşistî de hevkarîyê dide bikin, gerjî çijî ev Gemara hanê jî Sermeyedar bin yanjî Nîv Derebege bin, neyîne bidawîkirin.

• Bi karanîna mafeyê çarenûs, piştî ku Dagîrvan tête biderkirin, di rêya pîrspêkirina azad ji bal Xelkên Kurdistanê de tête bikin, herwehajî tede Kurdên ji Welêt dûrkişî jî têtin beşdarîkirin. Wehajî bi xwe jî ve ew bi baştir ve tête biderkevtin, heger ku ew pîrspêkirina hanê di bin çavdêriya Encûmena Netewên Yekgirtî de bête bikin.

• Armanc ji pêrabûnê bi mafeyê çarenûs ew bi xwe ve di rizgarîkirina Kurdistan de, di Yekkirina wê de û di Pêkanîna Dewleteke welatîyî Serbixwe ve li gora bîr û bawerîya pîrbûna Xelkê de tête bidîtin.

• Dewleta Kurd li ser bingehên Demokrasiyê û Serwerîya Milet de tête biavakirin, yê ku ew rengê serdarîkirinê ji xwe re û li gora dilê xwe de dide bihelbijartin û bixwestin. Herwehaji di nava wê Dewleta hanê ji de mafeyên Kêmanîyên Milî, Oldarî têtin bigirawkirin, Azadîyên Giştî têtin biberdankirin, Hatinên Welêt û xebatkirina Zaroyên xwe ji bona katkirina Abûrî, pêşvexistina Zanyarî û bicihanîna dadwerîya Civakî, nemaze ji bona berzkirina endazê Jîndariyê û Zanyariyê ji bona Çînîyên Gelêrî ji Cotkar, Karger û Destkaran tête bikaranîn:

• Tevgera Kurd ji bona rizgarîkirina Kurdistanê û bi serûştîya xwe ji ve ji bona nabûdkirina Faşistîyê, Regezperestîyê û Xwîngermbûna Oldariya kor dide biarmanckirin. Herwehaji pêrejî ew ji bona bicihanîna wan mercan dide biarmanckirin, yên ku ew dê alîkarîya çînîyên Gelêrî, nemaze yên Karger û Cotkaran li nik Miletên dorhêlê de di xebata wan de ji bona sitendina mafeyên xwe û azadîyên xwe bikaribin bidin

bikirin.

- Tevgera Rizgarîyî welatîyî kurd ji niha de ji bona peydakirina pêwendîyên hemsayî û hevkarîya Biratîyê dide bibangkirin, da ku ew ligel rojan de di navbera Netewê Kurdîyî rizgarîkirî de û Netewên dorhêlê de bêtin bixurtkirin, yên ku ew ligel hevdû û mîna hev de di navbera xwe de li ser têtin bilihevkin û ew rengên wan li ser berjewendîyên xweyî hevbeşî û berjewendîya her yekî ji wan de didin binîşankirin, da ku ew aşîtîyê û dostanîyê û pêşveketina jîrdariyê li heremê de bidin biparastin û bilezkin. Weha di nava sedsalê yekem de ji hebûna Dewleta kurd nabe bête bikin, ku ew dev ji liberxwedana welatî û Serdarîya Derveyî Diplomasî bide biberdan. Weha bes û bi tenha ve ew dikare bi pêwendîyên Konfederalî)ve ligel Dewletên dorhêlê de bide bitêrkirin. Wehajî ew dikare van pêwendîyên hanê hêdî hêdî ji bona Fêderalîya - Hevgirtî- piştî derbasbûna nêzîka sedsalekî bide bipêşvexistin, gerjî ku Netewên heremê di nava xwe de li ser vê çarekirina hanê de bêtin bilihevkin.

• Tevgera Kurd Koma Dewletên Bê Alî dide bipiştgirtin. Ew jî li ser sorbûna xwe de ji bona hilaînina tevaya bingehên leşkerîyî biyanî li Kurdistana rizgarîkirî de dide bidazanîn. Herwehaji ew ji bona danîna pêwendîyên dostanîyê û hevkarîyê li ser bingehên wekhevîyê de di navbera Kurdistanê de û tevaya Dewlet û Milletên din de bi hemû cudabûnên rêstikên wan ve dide bikarkirin.

\* Bîr û Bawerîyên Xebata Rizgarîkirina Welatî

• Jiber ku mafeyê Çarenûsê bi xwe ve ew di her bêhnekê de bi mafeyekî mayîn û her demî ve tete biderkevtin, weha tevgera rizgarîkirina Kurd dikare xebata xwe di yek perçî de yanjî di çend perçan jî de li gora zînetan dide bidestpêkirin. Wehaji gerjî wê li yek perçî de date bidestpêkirin, li ser wê de tete bipêwistkirin, ku ew wê ber bi pêş ve bide bixistin, da ku ew tevaya perçan mîna hev li ber xwe

de bide bixistin. Wehajî di hemû zînetan jî de divê di xebatê de du mercên neçarî bi bingehî ve jêre bêtin bidîtin:

- Divê armanca xebatê bi diyarkirî ve bête biderkevtin û pê hatibe bidazanînkirin: ku ev bi Pêrabûna mafeyê Çarenûsê û rizgarîkirina welatîyî Kurd ve tête biderkevtin.

- Ku tevaya hêzên Miletê Kurdîyî yekkirî di xebatê de bêtin bibeşdarîkirin.

- Çi gava xebatê date bidestpêkirin, weha ew bi xwe ve şerekî lidûhev û dirêj de tanî bi serketinê ve dide biderxistin. Ev xebata hanê bi xwe jî ve bi tu rengekî ve ne bi hajbûnekê ve û ne jî hîç bi "rawestandina teqemenîyekê" ve tête birazîkirin.

- Armancên xebata bilind ango pêrabûna Miletê Kurdistan bi mafeyê xwe ve di Çarenûsa xwe de û di bin çavdêriyeke Dewlî de bi xwe jî ve bi her rengekî jî ve Kes nikare li ser wan de jê bêtin bidaketin yanjî bikêmkirin. Evaya jî



dîde bîderxistin, ku her pêşkeşkirinên ji bal Dujminan de ji bona Miletê me têtin bikirin, ew bi xwe ve bes û bi tenha ve têtin bikirin, da ku ew Miletê me ji xebatê bidin bidûrkirin. Mîna pêşkeşkirinên wanî Nîv Çarekirî, Guhertinên wan û Xwedmoxtariyên wan û yên din ji "Razîkirinan" ku ew ji bal wan de dihatin bipêşkeşkin. Ne cih ji van pêşkeşkirinan re têtê bidîtin û bi serdejî ew ve di pêşîya pêşî de bi nayînê ve têtin bibersivkin.

- Tevgera rizgarîkirina Kurd di xebata xwe de bi yek carî ve li ser xwe de wergirtina alîkarîyê ji her Dewletekê, ji yên ku wan Kurdistan di navbera xwe de dane biparvekin, dijî yekeke din ji wan daye biqedexekin, nemaze jî gerjî ku Dewleta yekem "Nîv Çarekirin" di nava sînorê xwe de "ji bona Pirsîyarîya Kurd" dayite bidazanîn; jiber di vê pêşkeşîya wê de bes û bi tenha ve xapandinek têde têtê bidîtin, da ku Miletê Kurd bi rawestandina xebata xwe ve bête bibarkirin û di emcamê dawî de da ew careke din ligel Dewletên din de ji bona lêdana wî lê bête

bivegerandin. Mîna ku niha ev têtê bikin.

- Bi hîç corekî tevgera Kurd nikare ligel hîç Dewletekê ji wan Dewletan de yanjî ligel jimarekê ji wan de, ji yên ku wan Kurdistan di navbera xwe de dane biparvekirin, bide bigiftûgokirin. Bes û bi tenha ve ew wê çaxê dikare bide bigiftûgokirin, gava ku Dewletek yanjî Dewletan di pêşî de û beramber li pêşîya tevaya dunyayê de bi razîbûna xwe ve bi bîr û bawerîya pêrabûna Miletê Kurd ve bi mafeyê xwe ve di Çarenûsa xwe de date bidazanîn û pêrejî ligel jî de hêzên xweyî çekdarî ji nava Kurdistanê date bikişandin, yanjî ku ev hêzên çekdar ji berê de bi xwe ve ew ji nava erdê welêt hatibûn biderkirin. Di bin vê zîmeta hanê de gift û gokirin li derveyî herema rojhilata navîn de li ser erdê Dewletek bê bendkirî de têtin bikin Mîna ku gift û goyên Cezayirî - Firensî di vî babetê hanê de di sala 1962 de li ser erdê Siwêsrî de hatin bikin).

Heger ku perçeyekî Kurdistan bêtebirizgarîkirin, kîjan jî bit, divê li ser tevgera Kurd de xebata xwe bi bê

westandin ve bide bikirin, tanî ku rizgarîkirina tevaya Netewê Kurd bête bidawîkirin.

- Xebata rizgarîyî welatî wê hingavê tête bidawîkirin, piştî ku tevaya Miletê Kurd bi mafeyê xwe ve di Çarenûsa xwe de bi xwe ve bête bipêrabûn, Komara Kurdistan hate bidamezirandin û Serxwebûna wê hate bidazanîn û ew ji bal piraniya Dewletan de, nemaze jî ji bal Dewletên dorhêle de, yên ku Kurdistan ji wan xwe dayite biazadkirin û bicihêkirin, bi pê ve hatin birûniştin. Serxwebûn û Cihêbûn ne bi "şermezarîyekê" ve tête biderkevtin, mîna ku hinek pê didin bibawerkirin, lêbelê ew bi xwe ve ji bona vî Miletê hanê bi mafeyekî bingehî ve tête biderkevtin û ew bi xwe jî ve ji bona demokrasîyê bi mercekî pêwistî ve tête biderkevtin, na hêjbêtir ne rizgarîkirina Kurdistanê û ne jî Serxwebûna wêna ew bi xwe ve nexweşîyeke giranî û kevjalî di bin nav û nişana Faşîtiyê de û regezperestîyê de dide bixwedîkirin. Lêbelê rengê Serdarkirinê di Komara Kurdistanê de dibe, ku ew bi Navînî ve bête biderkevtin, herwehajî dibe, ku ew li gora

xwestina Gelê Kurd de bi xwe ve bi Fêderalî -Hevgirtî- ve bête biderkevtin. Lêbelê Nivîsvan bi xwe ve çarekirineke Fêderaliyî Demokrasî ji xwe re ji ber hin hoyan dide biminêkarkirin; ku niha ji wan re cî nayête bidîtin, ku ew bêtin biraxistin.

## 8. Şêweyên Xebata Rizgarîkirina Welatîyî Kurd:

Ji destpêkirina mêjûwê de Miletê Kurd di warên Leşkerî de ji taktîka liberxwedanê, yanî bêtir ji liberxwedana li ber xwe de di çiya û deştên welatê xwe de ji beramberî hêrişên derveyî pêve nedida binaskirin. Ev taktîkê hanê jî ji aliyekî de ligel serûştîya welêtî çiyayî û ji aliyê din de ew ligel hişê Eşîrtîyê yaxud Derebegîyê tête bilihevkin. Wehajî hegerjî Hêrişvan di hêrişa xwe de hate bişikenandin yanjî ew tête hate biserkevtin, Miletê Kurd xwe di nava erdê xwe de dide biçogkirin. Ango Miletê me ji heyamên dirêj de di bin dilovanîya hêrişên ji nişkêve dihate bijîyandin. Tevî ku di pir caran jî de Hêrişvan piştî hustê xwe dida bixurandin û bi şikestî ve di cenga xweyî hêrişê de ji Kurdistan dihate bikişandin. Weha vê rewşa hanê di derbasbûna heyaman de li nik Miletê Kurd de "Canekî liberxwedanê" date biafirandin, ku ew hêjî tanî vî heyamê hanê jî wî dide bihilgirtin, ku ew wî ji rewanî û leşkerî ji bona guhertina cenga liberxwedanê ji bona cenga hêrişê li ser erdê Hêrişvan de dide bixistin.

Wehajî gerjî me ji xwe re talanîyên Miletên di heyamên kevnar de li alîyekî de dane bivehiştin, Miletê Kurd ji diyarên xwe ji bona diyarên din ne hatiye biçûyîn, ji bil di pêla Musulmantîyê de di bin ala wê de û di bin navê wê de wê gava bi dehan hezar ji Suwarên wî di bin Rêberîya Fermandarên wî û Patîşahên Malbata Eyûbîyî Kurdî de ji bona rizgarîkirina xakê Surî, deşta nîlê, Qudsê û tanî Yemenê, Hicazê, Bengazî û Sûdanê ji talanîyên Xaçperestan dihatin birêketin. Ew pêla hanê bi xwe ve nala pêlekê di nava du kevan de têtê bidanîn, yanî ku ew di mêjûwa wî de bi xwe ve bi taybetî ve têtê biderkevtin. Herwehajî ligel Miletê me jî de hate bidîtin, ku Suwar û Serbazên wî jî di bin beyreqên Sultanên Binemala Osmanî û Şahînsahê Îranê de di cengên wanî firehbûnê de yanjî yên lêdanê de dihatin bibirêketin. Ew ji wan cengan bê pişk û par bû, mîna ku ew li Ewropa de, hin heremên Asya û Afrîqya Jorî de hatin bikirin.

Weha dibe, ku em di koma van hoyên ciyografi, civakî, rewanî de û di taktîka liberxwedanê de hoyê poşandî bidin bidîtin, ya ku Miletê Kurd ji bona pêkanîna Dewleteke taybetîyî ji bona xwe daye bitawîkirin -Ji bil Dewletên Derebegî pêve, yên ku ew li Kurdistan yanjî li dorhêla wê de di sedsalên dehan de ji bal Binemalên Zaroyên Hesnewî û Zaroyên Merwanî- Dostik, Zaroyên Rewend -û ne Ruwad-, Zaroyên Şedadî, herwehajî Binemala Xorşîdî û Binemala Fezlewî, bi serdejî ve Mîrneşîniyên din jî di dawîya pêla Derbegyê de hatin bipêkhatin.

Wê hingava ku têtê bigotin, ku Miletê me ji cengê ji bil taktîka liberxwedanê pêve nade binaskirin û ew rengên cenga hêrîşî nade bizanîn. Evaya bi xwe jî ve nade

biderxistin, ku em sitratîciya leşkerî nadin bizanîn, ya ku ew ji bona danîna neqşa cengê û rengên wê û civandina di navbera liberxwedanê û hêrîşê de piştî livenerandineke têrkirî ji bona hemû dayînên zînetê dide bipêwistkirin.

Belê pir di vî barê hanê jî de di sedsalê bîstan jî de ne hatîye biguhertin. Weha hemû cengên, ku Miletê me di nava wan de hatîye bidîtin û hêjî tanî nehajî ew di nava wan de têtê bidîtin, ew bi xwe ve bi cengên liberxwedanê ve têtin biderkevtin, hegerjî ew li ser şêweyên cenga anîyê jî bêtin bidîtin, mîna ku ew di navbera du Dewletan de têtê bikin. Weha evaya bi xwe jî yek carê ve di nava salên 1965-1975 de, nemaze di herdu salên wêyî dawî de hate bikirin, gava ku hêzên çekdarên sûreşa Mele Mustefa Berzanî li ber dol û tiraşên herema rizgarîkirî de li ser sînor de dida bidan, piştî ku hin çekên giran ji derve ji wan re hatin bigihaştin. Wehajî di pişt re jî şikestina mezin hate bidîtin, di wê roja ku hatina van çekan di mêjûwa 6. 3.1975 de hate bibirîn.

Cenga partîzanîyê yanî şêweyê cenga keleşiyê ew bi xwe ve bi nîzîktir ve ji bona karînen Miletê Kurd ji cenga anîyê) têtê biligorkirin. Lêbelê jî ew bi xwe jî ve bi cengeke liberxwedanîyê ve têtê biderkevtin; jiber ku têtê her û her dest dawîşandin û vekişandin li ser xakê Kurd de têtê bikin. Wehajî dibe, ku têtê şerên pir giran bêtin bidîtin, ku di nava wan de bi dehan ji Mirovan ve bêtin bikuştin û bi serdejî ve zîyanên zor mezintir li nik Hêrîşvan de bêtin bipeydakirin, lêbelê jî ne cîhana derve, na hêjbêtir ne jî paytextên wan Dewletan, yên ku wan di nava xwe de Kurdistan dane biperçekirin, bi wan şeran ve didin bibihîstin.

Weha govend, semawend, aşxane û mêvan serayên wan tevde vekirî dimînin û di nava wan de Borcuwazîya Miletê Hemsî ji xwe re govend û dîlanan bilidardixînin, di dema ku têde bombe li ser gundên Kurd de têtin bibarandin û napalm çandinîyên wî, canewerên wî û pêrejî bi serdejî ve pir ji Xelkên wî ji Zarok û Pîran didin bisûtandin. Weha cenga pêşmergetîyê dibe, ku ew ji bona armancên cuda bête bikin,

lêbelê ew li Kurdistanê de ji bona nîv çarekirinan yanî Xwedmoxtariyê tete biarmanckirin. Wisajî di nava wê jî de pêwendî di navbera Rêberîya Şûreşê û Serdarîya Borcuwazîya Dagîrkirî de bi hajbûnan û rawestandina teqekirinê ve dide bigihaştin. Evaya jî bi xwe jî ve bi şaşbûnekê ve tete biderkevtin, ku pir caran Şûreşa Êlûlê li Kurdistanê Îraqê de pê dihate bkevtin, wehajî niha jî careke din jî dibe, ku hêzeke şûreşê tete pê bête bikevtin, mîna ku deng jê tê û tete bigotin.

Her tevgerêke rizgarîyî welatî ew bi xwe ve bi tevgerêke şûreşgêrî ve tete biderkevtin. Weha ew di serûştîya xwe de û di nasîna xwe de bi hêrîşkirinê ve li ser Sitemkar de ji bona pozşikenandina wî, derkirina wî, guhertina rêstik û qanûnên wî û sitendina azadîyê dide bipêwîstkirin. Weha heger Sitemkarê Zordar li ser de neyêyete bihêrîşkirin û hustê wî neyêete bikurtkirin, dê ew her û her di xweşîya setemkarîya xwe de li ser Kursîya serdarîkirina xwe de bête birûniştin û ew dê bi lêdana pistên Zaroyên Milet ve bi qamçîyên xwe ve bêtin bişahîkirin. Weha bi vî rengî ve hîç tiştêk niye, ku jêre bi Şûreşa liberxwedanêv bête bigotin. Liberxwedana li ber xwe de ew bi xwe ve bi mafeyekî ji mafeyên bingehîyî



pêşî Merovan ve têtê biderkevtin û weha ew bi xwe ve di xwe de hîç şûreşekê nayîne bipêkanîn.

Wehajî tevlivêjî cenga pêşmergetîyê bi xwe jî ve, mîna ku ew li Kurdistanê de têtê bikirin, dagirtina bi dehan hezar ji Şervanên bi rêxisti ve ligel jî de jimareke pir ji yên ne rêxistî dide bidivakirin. Herwehajî pêrejî çekkirina wan, girawkirina teqemenîyê, anîna xwarinê û cil û bergan ji bona wan, girawkirina jîyana malên wan, nemaze ji yên Kuştîyên wan, ligel jî ji bona jimareke mezinî ji bil Şervanan jî ew dide bidivakirin. Evaya jî tev de bi hev re sermiyanekî pir gewre dide biniyazmendîkirin. Vê jî, mîna ku pir caran ew hatîye bikirin, Rêberîya Teverê ji bona kutana hin Derîyên Derve ji bona daxwazkirina yarmetîyê ji wan dayite bineçarîkirin. Weha heger ku tevger ji bona Xwedmoxtarîyê bide biarmanckirin, wetov dibe, ku Derîyê Derveyî kutayî bi hin yarmetîyan ve merdbûna xwe bide biderxistin. Ev merdbûna hanê jî ne jiber hezkirina wî û piştgirtina wî ji bona tevgerê têtê bikirin, lêbelê ji bona ew pê zîyanê bi wê Dewletê ve bide bixistin, ya ku jê Xwedmoxtarî têtê bidaxwazkirin. Weha dibe, ku ev merdbûna hanê tanî demekê bête bidirêjkin û di pişt re ew bête bibirîn.

Weha bi vî rengî ve rêberî girtîyê derdên xweyî darayî û pirsîyarîya peydakirina çek û teqemenîyê û girtîyê canê liberxwedanê têtê bihiştin.

Tev li vê tevî jî de cenga liberxwedanê dem di ser re hatîye biderbaskirin - û ez wê bi Cenga Bavpîran didim binavkirin -. Weha dijwarîya wê li ser Miletê me de ji dawîya cenga cîhanî duwem de hatîye bibêtirkirin û dê

dijwarîyên wê roj bi roj ve jiber çekên dujehîyî nuh bêtin bibêtirkirin, yên ku Dewletên Gewreyî çêkîrinê bi wan ve didin bibazirganîkîrin û ew wan ji bona Borcuwazîya Regezperestîyî serdarîkirî ji bona wan Dewletên, yên ku wan Kurdistan di nava xwe de dane biparvekirin, didin bifiroştin. Weha heger Miletê me xwe bes û bi tenê xwe ve li ser Cenga Bavpîran de bide bihiştin, dê ew wê bide bidûrandin, hegerjî çijî şêweyên wê jî di Cenga Keleşîyê de têtin binavînkirin.

Weha nema bi durustî ve tête biderketin, ku em ji bona Miletê xweyî mêrxas, yê ku ew di serûştîya xwe de bi gorîkirina mal û canê xwe ve tête binîşankirin, ji bona ketina cengekek wisa bidin bibangkirin, ku di dawîya wê de destan ji bona wî û wêrankirina welatê wî bi agir û hesin ve têde tête bidîtin û di pişt re jî pê barkirina bi darê zorê ve û jê re koletî têde tête bidîtin, piştî ku ew di qonaxa "Keleha Dorlêgirtinê" de tête biderbaskirin. Herwehaji bêtirbûna newekhevîyê di çek, mal, teqemenîyê de û bi bê dengbûna dereveyî Navdewletan de li qazanca Sitemkar de li ser me de bi remankirinê ve dide bidivakirin, ku em sitratîciyeke xebatêyî nuh bidin bidanîn, ya ku ew rastîya Kurdistanê, rastîya Dewletên, yên ku ew wê dagîrdikin, û dorhêla rojhilatê û cîhanê dide biberçavkirin.

Weha di vê sitratîciya hanê de tête bimerckirin, ku ew bi sitratîciyeke hêrîşkirinê ve bête biderkevtin; jiber her şûreşek, heger ku ew çî ji bona rizgarîkirina welatî yanjî civakî bide biarmanckirin, bes û bi tenha xwe ve ew bi hêrîşî ve tête biderkevtin. Ew hêrîşa xwe bi ser bingeên Sitemkarîyê, Zordarîyê û Kolonyalîyê ve dide bikişandin.

Lêbelê sitratîcîya hêrîşiyê ew bi xwe ve nebes yanî hêjî rastir nebes bi tenê ve jê ya sipahîyê dide biderxistin. lêbelê şûreş bi liberketina sipahî ve divê bes û bi tenha xwe ve ew di qonaxên xebatêyî dawî de û bi reng û şeweyên pê bi pê ve li gora karînen heyî û armancên jêre nîşankirî bête bikin.

Weha sitratîcîya hêrîşê bi xwe jî ve ew bi şûreşekê ve tête biderkevtin, ku divê ew di pêşî de di serê me de bête bikin û bi me ve bide neçarîkirin, ku em jê hişê Cenga Bavpîran, canê Keleha Dorlêgirtî û Hestkirina bi Şermezariyê, na hêjbêtir bi Tawanbariyê ve, heger ku bes bi serê xwe ve em remanê ji bona rizgarîkirina Netewê xwe û sitendina mafeyên xwe bidin bikin, bidin birakirin. Wehaji ji aliyekî din jî de ev sitratîcîya hanê jî bi girêdana "Hêrîşê" ve di pêşî de li ser warê remanê, mafeyî, rêxistinê û ramiyarî de li ser me de dide bidivakirin. Herwehaji di pişt re jî şeweyên weha bidin bipiştgirtin, yê ku Merov dikare wan bi "Mîna Sipahîyê" ve bide binavkirin, ligel jî de di wê hingavê de bi xwe jî ve li ser hêrîşên ragiyandinê û pêrabûnêndDiplomasî di nava Desteyên Navdewlî de û li hundurê jî de bête bigirêdan, da ku biryareyeke cîhanî jî bona kara pirsiyariyê bête biafirandin.

Weha bes û bi tenha ve piştî gihandina vê mebesta hanê Şeweyên Sipahiyî Şûreşgêrî pişt bi wan ve tête bidan û pê bi pê ve li gora sitratîcîyeke giştî li ser wan de tête biçûyîn. Wehaji û jîbervêjî ev letê hanê, yê ku jê beşê dawî tête bipêkhatin, "Bi Şeweyên Xebatê" ve û ne bi "Sitratîcîya Sipahî" hate binavkirin. Ev şeweyên hanê pêwistî bi xewendekariyeke giştî ve û bi rêxistineke zor bi rêk û pêk ve dide bikin, ku ew tevaya dayînan li ber çav

de dide bidanîn û bi hûr û kûrî ve li encamê her şeweyekî berî piştêdanê û likarxistina destikên wî de ew lê dide bivenerandin. Wehajî niha jî vaye ez jî hin ji van şeweyan ji bona nimûne û ji bona têrkirnê li gora danînekê de li ser pêşekîyê de li ser karîne de didimbi rêzkirin, bi têgihîştinekê ve ku her şeweyekî hatî ji bona yê berî xwe ji şeweyan bi xwe ve bi ser ve dide bivekirin. Bi vî rengî ve çivê çuyîn li ser de bête bikirin, da ku gewdêyê xebatê li pê hev de bête bigewrekin û karînen metiryalî û rewanî yên ji bona wê pêwîst roj bi roj ve di warên hundurû û derveyî de mîna hev jê re bêtin bipêydakin.

1. Weha bi serê xwe ve danîna Yasa Mafeyên Netewê Kurd, mîna ya ku ew bigir hatîye bidanîn û dazanîna wêna di nava Desteyên Navdewlî de û Rojnameîyê de bi xwe ve ew dê bi "Hêrîşeke Remanî" ve û bi zor ve bi kêr ve bête biderkevtin, ku ew dê bikaribe mîrxasîya Miletê me bide biberzkin, gava tê dê bide bilidarxistin û mêranîyên Stemkaran dê bidin bilawazkin û çavên tevaya gêtîyê li ser rastîya pirsîyarîya Kurd de dê bide bivekirin.

2. Lêbelê pêkanîna dam û destgehê Şûreşê yanî Berê yaxud

Sazmendîya Rizgarîkirina Kurdistan yanjî di bin navekî din jî de mîna wê û dazinana wêna di nav Desteyên Navdewlî de û li Hundurû de, ku dam û destgeh tevaya hêzên Miletê Kurd yên Demokrasî ji bona birêxistina xebatê û destpêkirina pê li pênavê rizgarîkirina Netewê Kurd de û ji bona pêrabûna Miletê Kurd bi mafeyê xwe ve di Çarenûsa xwe de dide bikomkirin, evaya bi xwe jî ve dê "Hêrîşeke Remanîyî" pir bi kêr ve bête bidîtin. Na hêjbêtir bi serê xwe ve, hingava ku em dam û destgehan didin bipêkanîn û pê em didin bidazanîn, "weha em ji pêşî de ji xwe re nivê şer didin biqazanckirin". Weha' li ser hustuwê dam û Destgehên pirsîyarîya rêxistina gavên xebatê û girawkirina destikên pêwîst jêre tete bikevtin.

3. Xweser bi cenga partîzanîyî bajarî yanî bes û bi tenha ve cenga nava bajaran tete bidestpêkirin, bi mercekî ve ku ew di derveyê Kurdistanê de û di nava Dewletên parvekirinên wê jî de bête bivêxistin û girêdana wê li ser paytextên van Dewletan û hin ji bajarên wanî gewre de bête bikin. Armanc jî vî şeweyê hanê bi xwe ve lêdana

Serdarê Stemkar di cihê serdarîkirina wîzaretên wî de, di îzgehên wî de, di pêkhatinên wîyî abûrî û sipahî de û ji wan jî pêkhatinên neftî û lûlê wan de, di firînxanên wî de, di benderên wî de di îstgehên kehrebên wî de û di rêyên çûn û hatinên wî de tête birin. Weha ji bona pêrabûna bi vê xebata hanêyî giring ve fêrkirin û likarxistina nêzîka bîst Qolên Pêşmerge têtin bitêrkirin, ku her Qolek jimara wan ji bîst Pêşmerge jîr, şehreza û mêrxas bêtir nayête bikin. Her qolek ji wan qolan ji hevdu bi carekê ve azadin û her yek ji wan bi Rêberîya Spahîyî Siyasîyî Giştî ve tête bigirêdan. Evaya bêtir ji tevaya 400 Pêşmerge pêve nade bipêwîstkirin û bi ser wan jî ve nivê wê jimarê jî ji Xelkên Alîkarên bêçek têtin biservekirin.

Weha divê nuhkirin û vegerandina pêkanîna van Qolan di dema ziyan pêketinê de û guhertina di nava wan de ji bona bînvekirina wanên, yê ku xebata wan hatîye bidirêjkirin, bête bikin. Weha dibe, ku ev xebata hanê hin ji salan bête bidirêjkirin.

#### 4. divê Cenga Partîzanîyî

Bajarî dijî pêkhatinên Dewletên Borcuwazîyên Kolonyalgerên Kurdistan bête bikirin, ji yên ku ew li cîhane derve û ji wan jî li Cîhana Siyem, Ewropa û Cihên din de têtin bidîtin. Di xebata Qolên Pêşmerge de di hundurû û derve de ji ziyapêketina bi Xelkên bê çek ji Zaroyên Miletên dorhêlê yanjî Miletên din ve divê bête bivegirtin, ev jî li gora rewešta rojhilat, mêrxasîyê û mirovanîyê de tête bikirin, ya ku Miletê me bi wan ve bi serfirazî vê tête biderkevtin.

5. Di heman kat jî de divê bi xwe jî ve girêdan li ser pêrabûnên êşkere de ji bona xebata Miletê me di rojnante û îzgehan de li derveyî welêt de û di îzgehên hundurû de yên tevgerê de bêtin bikirin. Herwehajî divê her pêrabûneke Pêşmergeyê li ser de bête bimorkirin û hoyên wê û armancên xebatê bêtin bidiyarkirin.

6. Alîkarîyên Rêxistinên Demokrasi yên Çînîyên Kargerî yên Miletên dorhêlê dikarin bêtin wbiêrgirtin, heger ku ew bi pêrûwê tevgera Kurd têtin birûniştin û ew pêwendîyên xwe ligel wê de di rêya

dam û destgehê ramyarî de û ne di rêya Qolên Pêşmerge de didin bigirêdan. Herwehaji hegerji van rêxistinên ji xwestin, ew dikarin di vê xebata hanê de bi rengekî rêxistîyî ser bi xwe ve bêtin bibeşdarîlirin.

7. Dadgeheke Şûreşgêrî Kurdî di nava dam û destgehê ramyarî de tête bipêkhatin. Ew fermanên xwe li ser wan Kesên tawankar de ji Serdar û Rêberan der mafeyê Miletê Kurd de û der mafeyê Kesên wî de, herwehaji li ser wan Kurdên Xînez ji de dide biderxistin. Ev fermanên hanê û hoyên wan piştî bicihanîna wan têtin bieskerekirin. Ev fermanên hanê li ser Mafeyên Mirov têtin bingehkirin, yê ku ew ji bal Yekgirtina Netewan de hatine biyasakirin.

8. Dirav ji bal Zaroyên Miletê Kurd li Kurdistan de , ji nava Dewletan û ji Barkirvanan û ji her yekî li gora tuwana wî de, herwehaji ew di dema pêwist ji de bi darê zorê ve tête bikomkirin. Ev ji ji bal destgehekî taybetî de tête bikirin, ku hîç pêwendîyên wî ligel Qolên Pêşmerge de nayête biderkevtin.



Divê di xerckirina diravî de çavtengî bête bidîtin û çavfirehbûn têde û nemaze di çûyînên derveyî de divê bêtin biqedexekin. Alîkarîyên Diravîyî Mirovanî dikarin bêtin biwergirtin, bi mercekî ve ku ew tu kêran li ser armancên tevgera Kurd û ne jî li ser çûna wê de dikarin bidin bikin, bi mercekî ku ew ne ji nava wan Dewletan tên, yê ku wan di nava xwe de Kurdistan dane biparvekin.

9. Pêkanîna pêwendiyên dostaniyê di navbera tevgera Kurd û Partî û tevgerên Bêgane de, yê ku ew bi Demokrasîyê û bi Mafeyên Mirov û Miletan ve didin bibawerkin.

10. Li ser destgehê ramyî de divê, ku ew li derveyê welêt de di hemû civîn, kongire û civînên salane de bête bibeşdarkirin, yê ku ew ji bal Sazmendiyên Navdewletan de têtin bikin. Weha divê ji Sazmendiyên ne Serdarî û di pişt re jî ligel Sazmendiyên Netewên Yekgirtî de, yê ku ew bi Encûmena Mafeyên Mirov ve têtin bigirêdan, bête bidestpêkin. Wehajî ligelî de li ser wî de divê, ku ew di kongirên

Partîyên Demokrasî û Dost de û di civînên Zanistî de, yên ku ji bal hin Zanistgehan yanî ji bal Pêkhatinên Mirovanîyê de têtin bigirtin, bête bibeşdarkirin. Wehajî li ser wî de divê, ku ew Pirsîyarîya Kurdîyî Rizgarîkirinê di nava van Desteyan tevan de bide biraxistin û ji wan biryarîyan ji bona alîkarîyê û piştgirtinê ligel Miletê Kurd de di xabata wî de li pênavê pêrabûna wî de ji bona mafeyê wî di Çarenûsa wî de bide biwergirtin.

11. Wê hingava tevgera rizgarîkirina Kurd bi hemû wan şeweyên çûyî ve bikaribe bête birabûn, ku ew biryareyeke Cîhanîyî Giştîyî diyar û hîmkirî ji bona piştgirtina mafeyê Miletê Kurd di Çarenûsa wî de û di rizgarîkirina wîyî welatî de bide biafirandin, wehajî pê jî dergehên piştgirtina Navnetewî û Mirovanîyê bi hev re jêre bêtin bivekirin. Weha bes û bi tenha ve di vê hingava hanê de tevger li Kurdistanê de bi xwe ve di kare bi şeweyê Cenga Pêşmergetîyê bide bidestpêkirin.

12. Li ser tevgera rizgarîkirina Kurd de divê, ku ew ji bona

vekirina Cenga Pêşmergetîyê li Kurdistanê de di dema pêwist de, berî ku mercê di deqa 11. hatî de bête bicihanîn, li kar be. Ev jî di wê çaxê de tête bidîtin, gava ku Dewletek yanjî ew Dewletên, yên ku wan Kurdistan di nava xwe de dane biparvekirin, şer li Kurdistanê de bi xwe ve li ser Miletê Kurd de ew bidin bivêxistin.

13. Divê bi Cenga Pêşmergetîyê ve li Kurdistanê de di jimarekê de ji hereman di yek demê de bête bidadan. Ew heremên hanê jî ne bes tenê jiber xurtbûna liberxwedana wan têtin bihelbijartin, lêbelê jî ew jiber giringbûna wanî sitrafîcî, abûrî û jiber cihê wanî ciyografî jî ji pêwendîyên çûn û hatinê, dan û sitendinên -Logistikî- têtin bineqandin. Weha destpêkirina Cenga Pêşmergetîyê li ser çûna şeweyên berê de dide bipêwistkirin, na hêjbêtir ew wan dide bipircarkirin.

14. Tevgera kurd di dema destpêkirina Cenga Pêşmergetîyê de li Kurdistanê de dide bikarkirin, ku ew Tevgerên Demokrasî, yên

Kargerî û yên Şûreşgêrî ji yên Miletên dorhêlê pê bide biliberxistin, ku ew jî dest bi xebata xweyî şûreşgêrî ve li heremên xwe de bidin bikirin û ew wê li wir de bidin bipircarkirin, da ew mafeyên xwe bidin bisitandin û piştgirtina xwe ligel Miletê Kurd de bidin biderxistin.

15. Di heman kat jî de bizava Kurd ji bona alîkarîya Miletên û Milîbûnên dinî stemkêş li Îranê de dide bikarkirin, da ku ew xwe bi şûreşgêrî ve bidin birêxistin û ew li pênavê mafeyên xwe de bidin bixebatkin.

16. Belê Cenga Pêşmergetîyê ji bona tevaya Kurdistanê li gora pêwistîyê û karînê de divê bête bikirin.

17. Cenga Pêşmergetîyê ji bona Cenga Anîyê di heremeke nîşankirî de nayête biguhertin, her ger ku jêre tevaya mercên pêwist li ser ronahîya serpêhatîyên Miletê Kurd de ji diravîyê, çek û teqemenîyê, yên ku nayên bibirin, neyêtin bitêrkirin.

18. Hingava tevgera Kurd

perçakî ji Kurdistanê xwedan giringbûneke sitratîcîyî pêwist bide biazadkirin û ew dikare wî bide biparastin, wê çaxê ew dikare pêkanîna Dewleteke Demokrasîyî Kurdîyî katî nala şêweyekî siyasîyî hêrişî di xebatê de bide bidazanîn. Weha ji bona vê gava hanê divê hin mercên nala pêrûniştina hin ji Dewletan û tevgerên welatîyî demokrasîyî din pê bêtin bipeydakirin.

Weha wekû Ceneral Şarl Dîgol carekê dayite bigotin: "Dem di ser wî Miletî re nayête biderbaskirin, yê ku ew hêza tevgera xwe bi Xortên nuhhatî ve dide binuhkirin".

## Paşgotin

Xwendevanên Hêja!

va ez vê gotara Kak Ismet li ber destên we didim bidanîn. Ev gotara hanê bi xwe ve li gora bîr û bawerîya min de cihekî wêyî pirî bilind, dûrbîn, giring û hêjbêtir pêwist di tevaya xebata me de tete biderketin. Ew ronahîyeke giştîyî givatşî li ser tevgera me de di seranserîya mêjûwa me de dide biavêtin. Bîr û bawerîyên pir giring û bi nerx ve di vê gotara hanê de tên bidîtin. Welatperwerên Kurd bivên yanjî nevên dê ew her û her bi wan bîr û bawerîyan ve bêtin birûkirin. Em tev dûr yanjî nêzîk dizanin, ku pirsra Çarenûsê ji bona Netewê kurd û bicihanîna wêna tevaya xebata Miletê Kurd li ser de tete bigerandin.

Kak Ismet ev pirsîyarîya hanê bi hozanîyeke pir mezin û zanebûn û hêjbêtir rastir ve ji bona Xwendevanan daye biraxistin. Herwehaji şeweyê xebatê ji bona gihandina armanca serxwebûnê ji bona Miletê Kurdistan weha diyar li ser bingehên serpehatîyên Miletên din de daye bixuyanîkirin.

Wehajî wî rast û durust xebata Gelê Kurd ji bona Xwedmuxtariyê daye biderxistin, ku ew nikare Miletê Kurdistanê ji bona Çarekirina Pirsiyariya wiyî Milî bide bigihandin.

Weha Xwendevan bi van pirsên hanê û yên din ve têtin beramberkirin, ku ew niha di serên pir ji Xebatvanên Kurdistanê de têtin bigerandin.

Bi taybetî ve di vê dema ku Serdariya îraqê welatê me dide bitalankirin û Xelkên wî û hemû Jîndarên din bi Bombên Kîmyayî dide bibarandin. Ev qonaxa hanêyî nuh bi darê zorê ve bi hinera pêşveçûa qanûnên jînê ve li ser me de dide bineçarkirin, ku Xwedmuxtari di Encamê dawî de bi xwe ve ew ne bes tenê bi xewnê ve têtê biderkevtin, na hêjbêtir ew bi xwe ve bi evsanê ve têtê biderkevtin. Evaya yek rastîyê li pêşîya xebata me de dide bineçarkirin, ku divê li ser Miletê Kurd de bes û bi tenha ve ji bona Çarenûsa xwe û pêkanîna Dewleteke Milîyî Serbixwe ji bona tevaya Kurdistanê bide bixebatkin.

Weha xebata wî bi kêmtirîn gorî û kurttirîn dem ve di serxwebûnê û yekkirina Kurdistanê de bi serketinê ve têtê bitac û xelatkin.

Ez ji Xwendevan û Rexnevanan hêvîdarim, ku ew bi çavekî mehrebani ve li vê wergerandina hanê de bidin bitemaşekirin. Werger bi xwe jî ve dizane, bê çend kêmanîyên vê wergerandina hanê pirin. Tevlivêjî min xwest, ku ez vê gotara Kak Ismet bi zimanê zikmakî ve ji bona Xwendevanên Kurd ji zimanê Erebi bidim

biwergerandin<sup>33</sup>.

Dr. M. S. Cuma

Berlin, Mahlsdorf, di 16. 12. 1988 de

-----

Ez vê wergerandina kurmancî ji bona Heval û Dostê xweyî hêja Fewzî Esed didim bidiyarîkirin; jiber bi saya serê wî ve tevaya karên wergerandinên minî kurmacî hemû hatine birastkirin. Dr. Cuma

---


<sup>33</sup>Ev karê hanê bi yarmetî û alîkarîya Fewzî Esed, Dr. Fewzî Resul, Mizgîn, M. A. Delawî û Dr. Ciwan Cuma hatiye bikirin. Ez dixwazim, li ser vê yarmetî û alîkarîya wan de ji dil û can sipasiya xwe ji bona wan bidim bipêşkeşkirin. Dr. Cuma











- Di dawîya gulana sala 1937 de li gundê kêstek de di herema Cezîrê de ez hatime bizayîn.
- Di dibistanên bajarê qamişlo de ji sala 1946 tanî sala 1956 de min date bixwendin.
- Di dibistanên bajarê şamê de ji sal 1956 tanî sala 1959 de min date bixwendin.
- Di sala 1959 de min dest bi xwendina xweyî zanistgehê ve li zanistgeha şamê de berê felsefê de date bikirin.
- Ji sersala 1960 de ez ji bona Elmanya hatim biçûyîn Piştî xwendina zimanê Elmanî li bajarê Koxil de ez di buhara sala 1960 de ji bona bajarê Monîx hatim biçûyîn û li wir de di zanistgeha wê de min zanistiyên dewletê tanî sala 1964 de date bixwendin.
- Di sala 1963 de ez ji bona Elmanya Demokrasî hatim biçûyîn û li wir de li bajarê Berlin de di Kolêca Abûrî de zanistîya abûrî û siyasîmin date bixwendin, der sala 1967 de min Diplom di zanistîya abûrîya siyasî de date biwergirtin û der sala 1972 de têde jî min Nama Doktora di zanistîya mêjûya abûrîya siyasî de date biwergirtin.
- Ji sala 1975 tanî sala 1992 de min di zanistgeha Hombold de li bajarê Berlin de di berê mêjûwa abûrî siyasî de didate bikarkirin.

Dr. M.S.Cuma